## Rêberek rewşenbîr û pragmatîst

»»» R:10



## Qasimlo û pirsa çarnivîsa hewbeşe Kurdan

»»» R:2

## Dr.Qasimlo û hizrên modern

»»» R:4

## Rêberekî Jîr û Zana

»»» R:5

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (450) 07-22-2023Buha (1000) Tûmen*

# Bi hilkevta 450emîn hejmara Rojnama agirî


**Rojnama Agirî ku ji aliyê Navenda Ragihandina Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ve tê weşandin û rojnameya fermî û zimanhalê Hizba Demokratê ye û 15 rojan carekê tê weşandin, bi ked û zehmeta hemî xebatkarên xwe 500 hejmar belav kirin.**

Li serî de hewce ye ku ked û zehmeta hemî wan kesan her ji desteya damezrênerên Agirî ve bigire heya hejmara herî dawî ku hejmara 500an e, dest xweşî û mandî nebûniyê ji wan bikin ku bi heçî awayî be di weşandina Agirî de zehmet kêşandine û xizmet kirine.

Agirî pîrozbahiyeke herî germ ji hemî wan kesên newest dike ku sadiqane hekî tenê bo rojekê be jî, ji bona çap û belavkirina Agirî zehmet kêşandine dike.

Gelek xebatkarên xemxwar ji bona ji dayîk bûna Agirî zehmet kêşandin û ked dan, gelek kesan di rêreva berdewamiya Agirî de tevlî bûn û rol lîstin, gelekan bi qelema xwe Agirî dewlemend kirin, gelek bûn ev kesên li darêtin, deste bendî, dîzayîn û terahiya Agirî de şewnixûnî kêşandin û westiyan.

Lewma, Agirî bi vê hilkevtê bi germî destê hemiyan digivişîne û pîrozbahiyê ji wan dike ku bêguma hekî keda wan nebaya renge îro rojê Agirî jî nebûya.




Agirî weke hewcehiyekê bû dema ji dayîk bû, valahiyek di medyaya Hizba Demokrat de seh pê dihate kirin, PDKÎ ku Hizbeke netewî û xwediyê derbasbûyeke pirşengdar a xebatê ye, û pêgeha vê Hizbê ne tenê li Rojhilatê Kurdistanê, belkî di hemî Kurdistana Mezin de jî pêgeheke herî bilind e, Kurd û Kurdistan rengîne û fire devoke, nedibû ku Partiya me tenê bi devokek ji devokên Kurdî siyasetên xwe biweşîne, lewra gelek hewce bû ku Agirî ji dayîk bibe û bi devok û rênivîs û rêzimana kirmanciya jorî bê weşandin ku piraniya gelê Kurd bi vê devokê diaxivin û dinivîsin û dixwînin.

Ji dayîk bûna Agirî ger çi xizmetek bi gelê Kurd û Kirmancî bû, bêguman dewlemendî û fire rengiya Hizba Demokrat jî dide xûya kirin.

Agirî bû pira di navbera Hizba Demokrat û Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê anku parêzgeha Urmiyê, Agirî bû pira peywendiya Hizba Demokrat û xebata Rojhilatê Kurdistanê di gel Bakûr û Rojavayê Kurdistanê û parek ji Başûrê Kurdistanê û Kurdên Qefqaziya û Ermenistanê û Qezaqistanê.

Agirî bû sedem û pencera di navbera gelek xebatkarên kurd li her derê cîhanê, di wan 500 Hejmarên Agirî de ku hatine weşandin, ger mirov mêze bike, bi sedan û belkî hezaran mijar û gotarên dewlemend ji aliyê xebatkar û Kurdên perçên din ên Kurdistanê di Agirî de hatine weşandin.

Di heman demê de van xebatkaran û Kurdên perçên din, bi xwendina Agirî haydarê bûyer û xebat û siyaseta Rojhilatê Kurdistanê û Hizba Demokrat bûne û şopandine.

Di dawiyê de bi hilkevta derçûn û weşana 500emîn hejmara Rojnama Agirî em pîrozbahiyê ji PDKÎ re dibêjin ku xwediyê Agirî ye, em pîrozbahiyê dibêjn hemî xebatkarên Agirî ku her ji dayîk bûna Agirî ve heya hejmara 500 ji bona man û dewama Agirî kar kirine, pîroz be ji hemî xwendevanên hêja yên Agirî û bi giştî hemî gelê Kurd.

Hêviya me berdewamiya Agirî ye ku ev jî bi alîkarî û keda newestan a xebatkarên Agirî hasil dibe.

# Qasimlo û pirsa çarnivîsa hewbeşe Kurdan



N: Dr. Mecîd Hekî

Di 14 û 15ê Cotmeha 1989an de li Parîsê, çend meh piştî terora Dr. Qasimlo konferans a yekem a Navneteweyî li ser pirsa Kurd bi rêve çû.

Ev konferans yek ji berhemên xebat û tekoşîna Dr. Qasimlo bû. Qasimlo di wê baweriyê de bû ku pirsa Kurd ne pirseke navxweyî û heta navçeyî ye, belku pirseke navdewletî ye û pêwîstî bi çareseriyeke navdewletî heye. Berî salekê di serdana Javier Pérez de Cuéllar de bo Misirê, Dr. Qasimlo di nameya xwe de behsa pêwîstiya çareser kirina pirsa Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê kiribû, ku ew raporteke kûr û binaverok li ser rewşa Kurdistanê û siyasetên dewletên dagirkarê Kurdistanê bû. Li wê nameyêde got ku pirsgirêka Kurd pirseke navneteweyî ye û hewceye çareseriyeka navneteweyî ji bo pirsa Kurd bihê berçav kirin.

Qasimlo di pirtûka xwe ya Kurdistan û Kurd de, azadiya herî kêm du parçeyên Kurdistanê bi taybetî Bakurê Kurdistanê weke şert û merc ji bo serxwebûna Kurdistanê dinirxîne.

Dr.Qasimlo di hemû axaftin û gotûbêjên xwe de, bi taybetî li derveyî welat, di wê baweriyê de bû ku Kurd bi giştî ji bo mafê çarenivîsê têdikoşin û kar û siyaseta hizbî bi karûbarên navxweyî yên welat û sînorên ku li ser Kurdistanê hatine ferzkirin ve girêdayî ye. her ku serbixwe bibe, ew ê ne parçebûna tu welatekî be, dê bibe yekbûna welatekî parçebûyî.

Wek li jor jî tê dîtin, Qasimlo:

**1. Çareserkirina pirsgirêka Kurd li parçeyekî Kurdistanê weke pirseke girêdayî hemû parçeyên Kurdistanê dinirxîne.**

**2. Pirsgirêka Kurd pirsgirêkeke navneteweyî ye ku çareseriyeke navneteweyî jê re hewce ye. Çareseriya pirsgirêka Kurd jî dikare pêşerojeke geştir û yekgirtîtir ji bo Rojhilata Navîn misoger bike. Ev gotar dê hewl bide ku bi kurtî van sê xalan rave bike.**

**1- Sînor nikarin pirsgirêka Kurd ji hev veqetînin**

Kurdistan beşeke mezin ji Rojhilata Navîn pêk tîne, ku di sala 1514an de piştî şerê Çaldiranê û paşê di dawiya Şerê Cîhanê yê Yekem, bi hilweşîna Împeratoriya Osmanî û hilweşandina peymanên 1905, 197 û 1905an de di navbera çar dewletên mezin de hat parvekirin. Kurdistan ji destên du împaratoran Tizar (Tsar) û Ingilîzan derket û ji ber peymana Sykes-Picot Kurdistan bû çar parçe û pirsgirêka Kurd piştî hilweşandina Osmaniyan bû mijara sê dewletên nû ava kirî piştî heweşana Osmaniyan û dewleta Îrana modern.

Pêvajoya damezrandina netewedewletê li welatên ku Kurdistan di nav wan de hatiye dabeşkirin, li ser esasê desthilatdariya kêmani li ser piraniyê hatiye damezrandin ji bo tepeserkirin û kûrkirina pirsgirêkên navxweyî û girêdana van welatan bi welatên kolonyalîst ên ku Peymana Sykes-Picot îmze kirine.

Parçekirina Kurdistanê nekariye têkiliyên çandî, civakî û heta bi şêwazê jiyanê yên kurdên parçeyên Kurdistanê qut bike. Sînoran nekariye qedera kurdan ji hev dûrxîne.

Dewletên desthilatdar ên li Kurdistanê, hest dikin ku Kurdistan bi rastî beşeke welatê wan yê dagîrkirî ye û serhildana gelê Kurd wek metirsî li ser "yekparçeyîya xaka xwe" dihesibînin, bi kêmanî di derbarê pirsgirêka Kurd de xwedî siyaseteke berdewam in. Her çend di dema aloziyên di navbera xwe de hewl dane Kurdên parçeyên din weke karteke zextê li dijî dewleta hevrik bikar bînin, lê ev kart têra xwe bikar neaniye ku bibe sedema serketineke stratejîk a Kurdan di beşa hevrik de. Di sala 1937an de ji bo kontrolkirin û tepeserkirina tevgera kurdan li deverên curbicur û bi navê parastina ewlehî û yekparçeyiya xaka xwe di navbera Tirkiye, Îran, Iraq û Efxanistanê de peymana Saadabadê hat îmzekirin. Xuyaya peymanê ne êrîşkarî bû, lê xalên 1, 4 û 7 ên Peymana Saadabadê rasterast bi pirsgirêka Kurd û stratejiya hevpar a van dewletan ve girêdayî ye ku tevgera rizgarîxwaz a gelê Kurd tepeser bikin. Beriya peymana Saadabadê, van dewletan ji bo tepeserkirina tevgera kurd hevkarî kiribûn, wek tepisandina Komara Araratê û şoreşa Samko Shakak.



Piştî peymana Saadabadê, dewletên desthilatdar li Kurdistanê hemû derfet ji bo tinekirina netewa Kurd ji bo meşandina stratejiyeke hevpar bikar anîn. Mînaka herî dawî ya polîtîkaya hevpar a dewleta Tirk û Komara Îslamî ya Îranê, heta Sûriye jî ku bi şerê navxweyî ve girêdayî bû di referandûma 17'ê Îlona 1997'an a li Başûrê Kurdistanê de.

Li gorî vê yekê Kurd çarenûsa hev in û pêşketina pirsgirêka Kurd li her parçeyekî Kurdistanê bandorê li parçeyên din ên Kurdistanê jî dike. Ev bû yek ji sedemên felsefeya siyasî ya Dr. Qasimlû di heman demê de, bi berçavgirtina rastiyên navdewletî û "mafên navdewletî" û ji bo têkbirina ezmûnên parçeyên din, Partiya Demokrat siyaseta destwernedanê di karûbarên navxweyî yên hevûdu de wek yek ji stûnên xwe yên siyasî pêk anî.

**2. Doza Kurd pirseka Nawnetewîye**

Di nameya xwe de ji Javier Prez Decular re, Dr.Qasimlo tekez dike ku heta pirsgirêka Kurd çareser nebe, Rojhilata Navîn aştî û pêşketinê nabîne. Pirsgirêka Kurd di dîroka nûjen a Rojhilata Navîn de pêşgirek mezin bûye li hember deselata û dagirkeriya Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriyê.

Ev hêza guhartin xwaz, ku dixwaze deselata hikûmeta navendî bi kêmanî bi awayek dadperwerane di herêmên netewî bê dabeşkirin, tu peywendiya xwe ya rasterast bi berjewendiyên welatên bi hêz re tinebû û ji pêkanîna berjewendiyên wan zêdetir serêş bû ji bo berjewendiyên wan.

Ji ber vê yekê jî li her welatekî pirsgirêka Kurd li gorî asta peywendiyên dewletên desthilatdar ên Kurdistanê bi derve re hatiye dîtin, ji xeynî Rojhilatê Kurdistanê ku nekariye sermayeya civakî ya navneteweyî ji bo wî beşê Kurdistanê çêbike.

Piştî bûyerên salên 1990'î yên Başûrê Kurdistanê, rizgariya Iraqê di sala 2003'an de û bûyerên van salên dawî yên li Îraqê, Sûriye û Tirkiyê, êdî Kurd ne tenê "pirsgirêk", lê yek ji aktorên siyasî yên Rojhilata Navîn û dewletên herêmê ye.

Bi destpêkirina şoreşa Jin Jiyan Azadî, derfetek nû ji bo Rojhilatê Kurdistanê hatiye pêş, ku bibe yek ji xalên werçerxana doza Kurd li Rojhilatê Kurdistanê li ser asta navdewletî.

Di van bîst salên derbasbûyî de partiyên kurdî li herçar parçeyên Kurdistanê bihêztir, bi organizetir, bi ezmûn û berfirehtir bûne. Rojhilata Navîn ji destpêka Bihara Erebî ve di nav bera kirîza deselatên dîktatorî û tunajoyiya Islamî de maye.

Desthilatdar ên herêmê Îslama siyasî weke derfetekê dibînin ku gelên herêmê paşweroyî bihêlin. Welatên rojavayî ji bo herêmê tu projeyên aso xulqên nînin û welatê Çîn şûna Amerîkayê li herêmedê digire. Lê pirsgirêkên siyasî û civakî yên li Rojhilata Navîn ewqas kûr in ku çareseriya wan di berjewendiya hemû ci-

Dom R:3

Doma R:2

vaka navneteweyî de ye, bi taybetî jî Yekîtiya Ewropa û Amerîkayê.

Di vê navberê de Kurd dikarin bi dîplomasiya nûjen û têgihiştina hiqûqa navneteweyî û berjewendiya hêzan, li herêmê bibe katalîzatorek bihêz û di dawiyê de bibin çareseriyek ji bo pirsgirêkan

**3. Çareseriya pirsgirêka Kurd jî dikare pêşerojeke geştir ji bo Rojhilata Navîn misoger bike**

Derbazbûy rênîşanderê paşeroja me ye. Nêrîna li dîroka Rojhilata Navîn nîşan dide ku ji serdema împaratorên Osmanî û Sefewî ve jî, tevî hebûna deshilatdariyeke navendî ya bihêz, deshilatdarî hatiye dabeş kirin. Beriya destpêkirina serdema dewletnetewe di welatên dagirkerên Kurdistanê de tu demekî weke îro hêzeke totalîter û li cihekî kom nebûye.

Di heyama beriya Sykes-Picotê de Kurd xwediyê cure rêveberiyeke xweser bûn û bi şoreşên curbecur ên weke şoreşa Şêx Ubeydullahê Nehrî, Bedr Xan Begê Botan îspat kirin ku xwedî hêz û potansiyela serxwebûnê ne.

Deshilatdariya Erdelan, Goran, Mokrî, Baban, Botan û hwd, beriya avakirina Rojhilata Navîn piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, nîşaneyên dîrokî yên asta xweserî û xwerêveberiya gelê Kurd bûn.

Di sed salên derbasbûyî de gelê Kurd li herçar parçeyan, tevî hemû zordarî, Enfal û jenosîdê, tenê neteweyeke ku li herêmê daxwaza demokrasiyê bi wateya rastîn kiriye û li hember rejîmên dîktator û totalîter berxwe daye. Şoreşa Kurd, eger ne bi şekl, lê ji aliyê naverokê ve, ji bo diyardeyên civakî yên li Rojhilata Navîn, bûye teşwîqeke xurt. Hêzên demokrat û dadperwer ên Iraq, Sûriye, Îran û Tirkiyê, ji bo berdewamkirina têkoşîna xwe her tim li Kurdistanê penaber bûne.

Xwîna ku neteweya Kurd ji bo azadiya xwe rijandiye, sedema sereke ya bêîstiqrariya rejîmên dîktator û mêtinkar li Rojhilata Navîn e. Rojhilata Navîn di warê jîngeh û ekosîstemên herêmê de guherînên bilez dibîne.

Çavkaniyên avê û avhewaya Kurdistanê dikare bibe çare ji bo paşeroja herêmeke ku di nava toza xwe de xeniqîne.

Çareseriya pirsgirêka Kurd yekane rêya pêkanîna demokrasî, pêşketin û aborîya domdar li Rojhilata Navîn e. Divê civaka navneteweyî vê rastiyê bê agahdar kirin.

Cihê jeopolîtîk yê Kurdistanê dikare ji bo me kurdan bibe derfetek taybet, divê peywendiyên kurdan yên dîrokî û berdewam ên bi welatên dagîrkerên Kurdistanê re wek metirsî neyê dîtin. Ezmûna peywendiyên me bi dagirkeran re û hewlên çareserkirina pirsgirêkan, tevî naveroka berevajî ya vê peywendiyê, neteweya Kurd dike baştirîn berbijar bo aştî û aramiya navçeyê. Îradeya neteweya Kurd di dirêjahiya dîrokê de îradeya demokratîkbûnê ye û neteweya Kurd hevalbendê xwezayî yê hemû hêzên demokratîk ên herêmî û navneteweyî ye, bi taybetî di nav neteweyên Fars, Tirk û Ereb de.

Tevî hemû astengiyên li pêşiya pirsgirêka Kurd li herêmê. Rewşa navneteweyî ya piştî êrîşa Rûsyayê ya li ser Ukraynayê û ji nû ve girîngiya jeopolîtîkê di siyaseta navneteweyî de, çareseriya aştiyane ya pirsgirêka Kurd mumkintir dike. Ev yek dê bi sazkirin û serkeftina proseya federalîzmê li welatên ku Kurdistanê parçe dikin, ango Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê dest pê bike.

Fedralîzm li Iraqê ji ber kultûra siyasî ya welat hîn di qonaxa destpêkê de ye û mixabin pirsgirêkên navxweyî yên kurdan sedemên sereke yên têkçûna federalîzmê û negihîştina daxwazên rewa yên gelê kurd li başûr in.

Lê ev jî sistbûna pêvajoya çareserkirina pirsgirêkên sereke yên herêmê ye.

Di sîyaseta navneteweyî de, realîst gelek caran balan dikişînin ser hevsengiya hêzê di parastin û berpirsiyariya aştiyê de. Ji perspektîfa siyaseta navneteweyî de, divê civaka navdewletî girîngiyê bide pirsgirêka kurd û bi parvekirina deshilatê û misogerkirina serweriya siyasî ya neteweya kurd li van welatan, çareseriyekê ji vê pirsê re bibîne.

Di senaryoyek wiha de, Rojhilata Navîn dê kêmtir bibe şahidê vejîna hêza navendî ya dîktator û zordar ku aştî û aramiya navçê û bi taybetî Yekîtiya Ewropî tehdîd dike.

Çareseriyeke bi vî rengî di pêşerojê de wê piştrast bike ku ti hêzên li herêmê nikaribin hevdu têk bibin û li şûna hêza hesinî hêza diyalogê ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkan bikar bînin.

Îro, berevajî dema îmzekirina Peymana Sykes-Picot li Rojhilata Navîn a aloz, hebûna dewleteke navendî ya bihêz û otorîter, ne tenê bi bandor e, di heman demê de gefek rasterast jî li ser berjewendiyên welatên azad e. Dîrokê îspat kiriye ku komkirina hêzê di destê netewek, kom û îdeolojîyekê de li ser neteweyên din dê bibe sedema aşitî û aramiyê li herêmê, belku berovajî wê dê bibe sedema jinavbirina neteweyên niha û yên paşerojê yên ku li wê herêmê dijîn.

Ezmûnên Iraq, Komara Îslamî û rejîma Beis a Sûriyê vê rastiyê îsbat dikin ku rejîmên dîktator dikarin karesatên mezin derbixin. Pêdiviya Rojhilata Navîn a pêşerojê bi îstiqrar, pêşketin û mezinbûna domdar heye. Ji bo vê jî çareserî ji jêr ber bi jor ve ye û kurd û Kurdistan mifteya van guhertinan e.

Avakirina sîstemeke demokratîk a pir netewe û pirçandî li welatên ku Kurdistan lê hatiye dabeşkirin û bihêzkirina federalîzma pirneteweyî li herêmê dikare bibe sedema beşdarbûna hemû gelên herêmê.

Berjewendiyên herî bilind ên welatên hêzdar û Yekîtiya Ewropayê hewce dike ku navçeyên sînorî yên parzemînê aram, aram û aram bin.

# Li welatê Alman çalakiyek di salvegera terorkirina şehîd “Dr. Qasimlo” û hevalên wî de bi rê ve ço

Endamên Hizba Demokrat li welatê Alman, li ber deriyê balyozxaneya rejîma Îranê li bajarê Hamborgê, çalakiyek lidar xistin.


Roja Şemî 24`ê Pûşperê, li 34`emîn salvegera terorkirina rêberê xwedî şiyan ê gelê Kurd Dr. “Ebdulrehman Qasimlo” û hevalên wî, endamên Komîteyên devera Hamburg û Berlînê li ber deriyê balyozxaneya rejîma Îranê li bajarê Hamborgê çalakiyek lidar xistin.

Xwenîşandan bi sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb” û ragirtina bîstek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqijê şehîdên doza rizgariya Kurdistanê, dest pêkir.

Di berdewamiyê de, “Şehriyar Neqişbendî” bi zimanên “Kurdi û Farsî” li 2 beşên vê xwenîşandanê de bas ji rola “Dr. Qasimlo” û hewldanên wî li xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd kir; Herwisa navbirî îşare bi berdewamiya hewlên terorîstî û dijî mirovahî yên rejîma Îslamiya Îranê li hember gelê Kurd û neteweyên din li Îran û welatên din de kir.

Li beşeke din a vê xwenîşandanê de, çalakvanê siyasî “Yedî Beledî” gotarek li derheq “Dr. Qasimlo pêşkêşî beşdarbûyan kir û piştre peyama Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bi zimanê Almanî ji aliyê “Ronak Serhedî” ve hate pêşkêşkirin.

Herwisa “Hesen Başende” ku ji aliyê Komîteya Devera Hambûrgê ve hat-




ibû gazîkirin, peyama Partiya Xelkê Belûçistanê xwend û peyama Encumena Girtiyên Siyasî, ji aliyê “Eta Zerdeştî” ve hate xwendin.

Li berdewamiya vê çalakiyê de, “Mihemed Tahû û Rafa Serrût”, çend sirûdên şoreşvanî strandin û “Soran Mehmûdî” jî helbestek amade kiribû ku bo beşdarbûyan, xwend.

Li beşa dawîyê de, “Dawûd Elîxanî” peyama “Endamên Yekîtiya Serbixwe ya Rêkxirawên Siyasiyên Hamborgê” pêşkêşî beşdarbûyan kir.

# Dr.Qasimlo û hizrên modern



N: Nûredîn Sogîzade

Hizrên modern û pêşkevtî û serdemiyane, bêguman bi wan hizr û ramiyariyane re dibêjin ku gorî jiyan û civak û siyaset û deshilatên îroyîn li cîhanê de dikare hemî aliyên jiyana civatgehê û mirovan berçav bigire, dikare wekheviyê dabîn bike, dikare demokrasiya rastîn dabinê, dikare dadperweriya civakî û qatî û siyasî bixe nava civatgehê, dikare piloralîzma siyasî û azadiya partiyan biparêze. Dikare hêza yekemîn a diyarî kirina deshilatê bide destê xelkê. Heçî kes û aliyek û hêzek ku xwedî û hilgirê wan hizran be ku bikare civatgehê bigehîne rewşeke wiha pêşkevtî, bêguman xwediyê hizrên herî pêşkevtî û modern ên serdeme.

Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo rêberê tevgera rizgarîxwazaneya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û Sekertêrê PDKÎ xwedî û hilgir û danerê hizr û teoriyekî herî pêşkevtî bû ku dixwast li pêşerojê de gelê me û Kurdistan bibe xwediyê deshilat û dadperwerî û siyaseta herî pêşkevtî ya cîhanê.

Di serdemekê de ku hin alî û hêzên xebatkar û siyasetmedarên Kurd di ser vê baveriyê bûn ku Kurdayetî û xebata Kurd ji bona rizgariya ji dest dagîrkerên Kurdistanê tenê divê ji riya xebateke radîkal a nasyonalîstî ve bê berçav girtin û nabe xebata Kurdan xwe girê bide bi hinek teoriyên Rojavayî wek demokrasî, lîberal, an sosyalîzm û komonîzmê û yên dinê …hwd.

Bi berewajî di demekê de ku hin hêz û aliyên siyasî û kesayetiyên Kurd û xebatkar li ser vê baweriyê bûn ku divê Kurd berî Kurdayetiyê divê di serî de xebatê bike ji bona yek ji teoriyên biyanî weke Komonîsm û Sosyalîsm û çep, û merama wan a sereke divê wekhevî û dadperweriya civakî be.

Di demekê de ku hebûn di nava xebatkar û siyasetmedarên Kurd de ku li ser vê baweriyê bûn ku ji bona vê ku Kurd bigihîjin bi qedera xwe a siyasî divê xebat tenê di çarçêveya deshilata dagîrkerên dîktator de û ji riya demokrasiyê û hilbijartinê an îmtiyazên xêr pêkirî yên dujminan ve be.

Ev jî di demekê de bû ku xwedî û hilgirên wan hizrên serve wiha hesab dikirin ku nabe çi yek ji wan hizran û teoriyan tevlîhev bên kirin, belkî divê heçî yek ji wan hizran bi awayeke serbixwe û dûr ji hizreke din û tevlî kirinekê bigihîje bi armanca xwe, lewra hertim hilgirên wan hizran dijberî hev bûn û li hember hev du de rawestiya bûn û van wisa dizanîn ku Demokrasî û Nasyonalîzm û Sosyalîzm û mafê Netewî dijî hev dune û heçî hêz û aliyek bo mînak Nasyonalîzm be, êdî nikare kesekî çep û sosyalîst be, an wisa dizanîn ku hekî kes û aliyek demokrat be , êdî nikare xebatkarekî radîkal be , an kesekî sosyal be, rast di wî serdemî de rêberê lêzan şehîd Dr. Qasimlo bas ji teoriyekê kir ku dikarî hemî wan fikr û teoriyan anku Sosyalîsm, Demokrasî, û Nasyonalîsmê bi hevre girê bide û xebata Kurd ji bona rizgariyê ewqas mecal heye ku bikare hem Nasyonalîsmeke radîkal a kurd be, hem demokrateke hilgirê fikra qebûlkirina piloralîzm û cudahiya hizban û bawerî bi hilbijartin û dengê azad ê xelkê hebe û hem sosyalîstek be ku bawerî bi dadperweriya civakî û wekheviya jin û mêran hebe û mafê zehmetkêş û hejaran jî ber çav bigre.

Dr. Qasimlo ji bona têkhelkêşkirina wan teoriyan, teoriya "Sosyalîzma Demokratîk" anî nava leyîza siyaseta Kurd û wekî armanca pêşeroja Hizba Demokrat xiste nava bernameya siyasî ya PDKÎ.

Dr. Qasimlo ku her ji temenê lawiniya xwe ve tevlî karê siyasî bibû, wî her piştî avabûna Hizba Demokrat û damezrîna Komara Kurdistanê, xebata xwe ya siyasî li nava yekîtiya Ciwanên Kurdistanê destpêkir, piştre tevlî hizba Tûde ya Îranê bû ku hilgir û teqlîdkerê Hizba Komonîst a Soviyetê bû, ji nêz ve hem di gel fikra Kurdayetiyê û hem di gel fikra çep a basê dadperweriya civakî û mafê zehmetkêşan dikir, aşina bibû.

Piştre ku Dr. Qasimlo ji bona xwendina bilind diçe Ewropa û li du qonaxan de li welatên Wekî Firansa û Çekoslawakiya dixwîne heya doktoraya xwe ya li ser rişta abûriya siyasî werdigere û piştre her li Ewropa dibe mamostayê zanîngehê, rast di wî serdemî de dikeve nava karê siyasî yê PDKÎ de.

Şehîd Dr. Qasimlo berê ku gelek baş di gel hizra siyasî a Kurdayetî "Nasyonalîsm" û edaleta civakî "Sosyalîsm" aşna bibû, vê carê li ewropa digel demokrasî û hizrên pêşkevtî nasiyar bû.

Şehîd Dr. Qasimlo ku xwe wekî siyasetmedarekî lîberal û maksîst didît, dema ku kevte nava xebata Hizba Demokrat û bitaybetî berpirsayetiya yekem a vê Hizbê kevte ser mil, xwast teoriyeke nêzîk li îmkanê bîne nava teoriyên wê serdema xebata siyasî, û bo cara yekem di kongira 5 a Hizbê de bas ji vê hizra xwe kir û Kurd û bi taybet Hizba me dikare wan teoriyên ji hev cuda pêkve girê bide.

Di wî serdemî de Kongira 5, hinek endamên Hizbê mabûn heyrî ku çawa dibe Nasyonalîsm û Sosyalîsm û Demokrasî bihevre bên girêdanê.

Berevaniya Rêberê mezin û xwedî ezmûn û piraniya wan teoriyan ji nêz ve naskirine û xalên lawaz û dewlemend ên wan teoriyan naskirine û ceribandine, ev bû ku em wekî Kurd û Hizba Demokrat di vê qonaxê de xebatê dikin ji bona azadî û rizgariya Kurdistanê heta ku gelê me bikare qedera xwe ya siyasî netewî bigre dest xwe, bo gihîştin bi vê armanca pîroz û netewî jî em mifahê ji heçî rê û mikanîzmeke xebatê werdigrin û xebata xwe bi rewa dizanin, dema ku wisaye em Hizbekî radîkal û nasyonalîsm a Kurd in.

Em dema xebatê dikin ji bona azadiya neteweya xwe, bê guma hemî qatên civakê, hemî texên nava Kurdistanê, hemî cudahiyên olî, devokî, cinsiyetî, gundî, bajarî, xwendewan, nexwendewan, dewlemend, hejar, mamosta, cotiyar û kirêkar, civatgeha kurdistanê û gelê me pêktînin, ku wisaye dema Kurdistan rizgar bû ji dest dagîrkariyê û Kurd xwe hakimê xwe bû, em wekî PDKÎ wekî aliyekî siyasî ger ji riya hilbijartina azad a xelkê xwe ve gihîştn bi deshilatê, bê guman em ger nekarin dadperwerî û wekheviyê di nava civatgeha Kurdistanê de çêbikin, renge tenê rizgar kirina Kurdistanê têrê neket, divê em bikarin wekheviya di navbera jin û mêran bi kiryar cîbicî bikin, divê em bê mafiya ku karger û zehmetkêşên Kurdistanê bi dirêjahiya dîrokê di gel de hember bûne, li ser wan rakin û divê hemî xelkê Kurdistanê û bi taybet qata zehmetkêş û karger û kêm dahat, bikare ji serwet û dahata welat behremend be, hingê me kariye bi awayekî dadperwerane hemî civatgeha kurdistanê bi çavekê mêze bikin.

Dr. Qasimlo ku li Ewropa ezmûnên baş li ser hilbijartin û azadiya partiyan, û destaûdest kirina deshilatê ji riya hilbijartinê û dengê xelkê ve peyda kiribû, li ser vê bawerê bû ku êdî ev serdem bi ser çoye ku hizr û îde û teoriya kite hizbekê tenê bikare îdara civatgeha welatekê bike û her tişt di qorixa aliyekê de be ku pitir part û aliyên komonîstî û hizrên çep ên pirotariya kirêkarî ku ji sovîyetê ve banga dadperweriya cîhanê dida, xwediyê vê hizra siyasî bûn ku nabe ji bilî wan tu alî û hêzekî siyasî û teorî serî hilbide û hebe.

Dr. Qasimlo wisa hesab dikir ku hizbek an hikûmetek dikare nasyonalîsm be, dikare çep be û basê dadperweriya civakî û mafê zehmetkêşan bike, hev dem dikare demokrat be jî, tu aliyek nikare bas ji edaleta nava civakê bike, bas ji wekheviya jin û mêran bike, bas ji dabînbûna mafê zehmetkêşan bike, lê xwe sepên be û amade nebe wî mafî bide xelkê ku herbixwe bi dengê xwe deshilata birêveberiya xwe hilbijêrin.

Demokrasî, Hilbijartina azad, azadiya hizban" piloralîzm" qebûl kirina hizr û teoriyên cuda, azadiya rojnamevanî, azadiya hebûna mafê nerizayetiyê û mangirtinê, hebûna mafê raderbirîna azad û bi giştî hemî ev mafên ku aliyek ji bo xwe bi rewa dizane , divê ji bo her aliyekî siyasî bi rewa bizane, bi wateya hebûna demokrasiyeke rasteqîne ye. Wate li civatgehê de tu kes li ser hebûna eqîde, bîr û bawer, fikra siyasî, nekeve ber xezeba deshilatê û neyê tepeser kirin û maf jê qedex nebe.

Dr. Qasimlo ev 3 mijar û hizrên ku heya wî serdemî her kesî û bi taybet xebatkarên Kurd wisa dizanîn ku dijberê hev in, wate Nasyonalîsm, Demokrasî, û Sosyalîm, kirine yek dirûşm û li ser vê bawerê bû ku civatgeheke wekî ya Kurdistanê, hewcehî bi her 3ê teoriyan heye û kurd nikare bêje ez sosyalîstim û nikarim demokrat bim, Kurd nikare bêje ez xebatkarekî radîkal ê netewî me nikarim dadperwer û sosyal, an demokrat bim.

Dr. Qasimo qonaxê peyrewî kirin ji vê têkheklêşa wan teoriyan ji hev cuda kiribûn. Em niha di halê xebatê dan e rû li ser deshilatê ninin, lewra xebata me hewcehî bi metodên cuda yên xebatê heye, lê ya girîng eve ku dema piştî rizgariyê em bikarin bo xelkê xwe, bibin bi deshilateke Demokrat, Sosyal, û welatperwer.

Ev jî kir bi dirûşmek li jêr navê Armanca Pêşeroja PDKÎ Sosyalîsma Demokratîk.

# Rêberekî Jîr û Zana



**N: Şehab Xalidî**

Roja 22.04.1368 (13.7.1989)'an Dr. Ebdulrehman Qasimlo sekreterê giştî yê PDKÎ û Kak Ebdullah Qadirîazer endamê Komîteya Navendî a PDKÎ û Fazil Mihemed Resûl ku Kurdekî Îraqî û dostê PDKÎ bû, di bajarê Viyenê de ketne ber destrêjiya çekên çend kes ji terorîstên Komara Îslamî a Îranê û hatne şehîdkirin. Ew terorîstên ku wekî nûnerên Komara Îslamî a Îranê û bi armanca gengeşekirina li ser pirsa Kurd bi wan re rûniştina hevpar pêk anîbûn.

Di rastî de ev cinayeta tenê derheq xelkê Kurdistana Îranê û PDKÎ nehatibû kirin, belkî gefeke rasterast jî bû li ser hikûmeta Utrîşê (Nemsayê) û bêhurmetiyeke gelek mezin jî bû li dijî yasa û pirensîpên navneteweyî, çimku terorîstên Komara Îslamî a Îranê bi navê dîplomat ji pasporta dîplomatîk mifah wergirtin û bi vî awayî karîn bêy vê ku çi astengek bikeve ser rêya wan, vê pîlana xwe ya nemirovane bi rê ve bibin.

Danûstandinên bazerganî li navbera Îran û Utrîşê ji aliyekî ve, û bêdeshilatiya neteweya Kurd ji aliyekî din ve bûne sebebê vê yekê ku dad û exlaq, mirovayetî, û demokrasî bibin goriyê qazanc û berjewendiyên hikûmeta Utrîşê. Ji me re jî eyan bû ku demokrasî û mafên mirov heya wî çaxî têne berçavgirtin ku digel qazancên dewletan yek bin.

Bi şehîdbûna Dr. Qasimlo, PDKÎ û neteweya Kurd rêberekî gernas û rêzan, tevgera demokratîk û şoreşvanî a welatê me jî kesayetiyekî gelek hêja û pêşeng ji dest dan, lê kesayetiyên wiha mezin û egîd ne tenê di dema jiyanê de mezin in, belku piştî mirinê jî her wisa mezin dimînin, çimku mirovên mezin hekî di dema jiyana xwe de dikarin bandorên kûr û erênî li ser jiyana xelkê danên, bi mirina xwe jî neteweyekê û welatekî dihejînin û bi milyonan mirovan kovandar dikin. Hekî mirina hinek kesan bi bihurîna zeman ji bîra mirov diçe, lê nav û bîra vî rêberê me yê mezin û kiryarên wî ji bîra çi azadîxwazekî/ê naçin. Kul û kesera jidestçûna wî jî bi bihurîna zeman di dilê rêvîngên rêya wî de qet dernakeve.

Dr. Qasimlo di tewahiya jiyana xwe de ji bo xizmetkirina bi gelê xwe xebitî û her di rêya serbilindî û serfiraziya neteweya Kurd de jî canê xwe gorî kir, lewma hewce ye ku bi sedan pirtûk li ser kesayetiya Dr. Qasimlo bêne nivîsandin, bo vê çendê ku xelkê Kurdistanê û nifşên din ên neteweya Kurd pitir kesayetiya wî xweşmêrê dîroka neteweya Kurd nas bikin û rêya xebata Dr. Qasimlo bikne rêya xwe.

Dr. Kemal Mezher (1937-2021) yek ji dostên herî nêzîk ên Dr. Qasimlo dibêje: "Xwazî ku rêvîngên rêya Dr. Qasimlo ew hemû taybetmendiyên Dr. Qasimlo di pirtûkeke serbixwe de weşandiban ku ez xatircem im wê bibe rênîşandereke gelek baş, û ji neteweya Kurd re wê gelekî hewce be".

Herçend ku niha hindek pirtûk li ser jiyan û xebat û tekoşîna wî hatine nivîsîn û gelek ji axaftin û şîret û nivîs û hevpeyvînên wî di çend pirtûkan de hatine komkirin jî, lê dîsan jî riya wî di siyasetê de û dilsojî û cangîrîtiya wî bo neteweya Kurd bo vê hindê dibe ku bi sedan pirtûk ji aliyê kesên şareza û akademîsyen ve bêne nivîsîn, bo vê ku bibe çirayeke geş bo ronahîkirina riya xebata nifşên siberojê.

Çimku wî rêberê jîr û zana heya wê demê ku di jiyanê de bû gelek girîngî dida nifşa nû û nifşa siberojê.

**Dr. Qasimlo derheqê "şehîdbûna heval û hevçeperên xwe li pêxema jiyaneke baştir bo siberoja zarokên me" dibêje:**

**"Xebata me xebateke berheq e, xebat ji bo azadiya neteweyekê ye, xebat bo pêşeroja zarokan û nifşên dinê ye. Hekî em wekî nifşa niha erkên xwe bi başî encam bidin, emê bikarin hêvîdar bin ku nifşa piştî me şehîd tunebin.**

**Herwisa hekî nifşa rabihurî, an jî nifşên rabihurî bi başî erkên xwe cîbicî kiribana, renge vê nifşa me şehîd tuneban."**



Ew şîreta Dr. Qasimlo di vir de bi zelalî nîşanî me dide ku ew çiqas di hizra serbestî û jiyaneke birûmet û azad bo nifşên piştî xwe bûye, û xema wî ew bû ku hekî nifşa niha nirxa azadiyê nedin, nifşên siberojê nikarin jiyaneke aram û ewle hebin.

Ji aliyekî din ve dema ku bi nav azadîxwazên faşîst û dijîkurd li wî rêberê jîr û zana dipirsin ku, gelo ti garantiyek heye ku di siberojê de hûn behsê cudabûnê nekin û Îranê parçe parçe nekin? dibêje wan: "Em li hemberî nifşên siberojê de berpirsiyar nînin".

Di vir de navbirî hem bi ser nifşa siberojê de biryarê nade, û wan di hilbijartina her diruşmekê de serbest dihêle, û hem jî bi vê bersivê aliyê hemberî xwe bêdeng dike.

Herwiha nivîsîna pirtûka "Kurdistan û Kurd" jî xema wî rêberê jîr bo siberoja zarokên me bûye. Wî hewl daye ku bi vê berhema xwe gelek zanyariyên hûr bi belge û bi data derbarê dîrok, erdnîgarî, rewşa aborî û jiyana Kurdan de bide nifşa piştî xwe. Ew berhema wî bêguman niha, û heta di siberojê de jî bo nifşên piştî me gelek bisûd û girîng dibe.

Herwek ku xwîner jî dizanin pirtûka bi navûdeng a "Kurdistan û Kurd" lêkolîna siyasî û aborî a Dr. Qasimlo ye, ku navbirî sala 1957'an dest bi nivîsandina vê pirtûkê kiriye, û sala 1962'an bo çapê berhev kiriye, û sala 1964'an bi zimanê Silowakî, sala 1965'an bi zimanê Îngilîzî, sala 1969'an bi zimanê Polonî, sala 1970'yî çapeke kurtkirî bi Erebî, sala 1973'an bi zimanê kurdî (soranî), sala 1991'an bi zimanê Kurdî (kurmancî) çap û belav bûye.

Profisor Martînîts di pêşgotina çapa Îngilîzî de nivîsandiye: Pirtûka Dr. Qasimlo "Kurdistan û Kurd" bo nasandina pirsa Kurd bi giştî û hinek warên vê pirsê bi taybetî nirxeke bê hevta heye.

Kovara siyaseta navneteweyî -hejmar 10, sala 1965'an Prag -li ser vê pirtûkê nivîsandiye:

Ev rêya ku nivîskar ji bo lêkolîna li ser pêkhateya civakî û aborî berçav girtiye, hetanî îro jî di wêjeya aborî a me de ku li ser arîşeyên welatên geşekirî lêkolînê dike bê hevta ye, û bingehek e ji bo lêkolîneke weha li ser welatên din.

Li ser bergê çapa Silowakî a Kurdistan û Kurd, sala 1964'an, Biratsîlawayê hatiye nivîsandin: Me gelek negotiye hekî em bêjin ku xwînerê Silowak bi vê pirtûkê nivîsîneke bêhevta dest wî dikeve. Ev pirtûk cehd û tekoşînek e bo zelalkirina arîşeyên Kurdan ji dîtingeha marksîstî ve.

Bêguman rêberek ku hemû jiyana xwe bi sermiyana me`inewî, zanistî û madî ve ji bo serfirazî û bexteweriya nifşa niha û siberojê a gelê xwe danîbe, ti carî nayê jibîrkirin û di dil û mêjiyê gelê Kurd û hemû azadîxwazên rasteqîne de, dê bo heta heta zindî bimîne.

Çimku ew bo neteweyeke bindest û zulimlêkirî xebitî, û neteweya wî jî dê xelata wê ked û tekoşînê bide wî.

# Demokrasî di nerîna Dr. Qasimlo de



N: Mihemedsalih Qadirî

Demokrasî çi wek kultûr û çi wek mikanîzma siyasetkirin û deshelatdariyê li cîhanê û bi xasmanî li Rojhelata Navîn xwedî piroseyeke dirêj û di heman demê de li gor zeman û cihên cuda cuda xwedî pênase û bikarhînana cuda cuda ye.

Li hin cihan wekî emrazeke taktîkî bo gihîştin bi deshelatê tê bikaranîn û li hin cihan wekî kultûr û baweriyeke stratejî bo damezraweyîkirina hikûmet û rêvebirina civakê tê mêzekirin.

Li gor nerîna Dr. Qasimlo "Di her sîstemeke dîktatorî de, bêy cihgîrbûna demokrasî û sîstemek demokratîk, çi garantiyek bo aştî û wekheviya civakî û mafê neteweyî nîne".

Li gor vê nerînê xûya dibe ku dîtina Dr. Qasimlo derheq demokrasiyê mijareke stratejîk bûye û demokrasî wekî alternatîveke bingehîn li dijî dîktatoriyê daniye.

Lewma em dibînin Dr. Qasimlo di diyarîkirina stratejiya PDKÎ bo xebata neteweyî, silogana "Demokrasî bo Îranê û Otonomî bo Kurdistanê" bi zanebûn diyarî kiriye, û demokrasî berî otonomiyê aniye.

Çimku Dr. Qasimlo baş zaniye ku li hember rejîma dîktator a paşayetî, yan jî îdeolojiya Weliyê Feqîh (rejîma melayan) di Îranê de, tenê sîstema demokrasiyê dê bikare hem wekî şêwaz û deshelata hikûmetê û hem jî wekî hişmendî û kultûra wekheviyê, di nav civakê de li dijî eqliyeta şovênîstî, xwedî rol û bibandor be.


Herçend dema ku Dr. Qasimlo li ser mijara demokrasiyê ewqas pêdagirî dikir, ji aliyê hin kes û aliyan ve dihate lomekirin û ew nerîna Dr. Qasimlo wekî sazişkarî dihesibandin, lê çi hingê û çi niha piştî derbazbûna bi dehan salan, bo her siyasetmedarekî waqi`ibîn ku şarezayê pirsa Kurd di Rojhelata Navîn de be, dizane ku demokrasî kilîda vekirina wê girêhişk û dergehê dadayî ye ku ji sedsalên bihorî heta îro, ji aliyê dagîrker û neyaran ve ji bo bêmafkirina gelê Kurd, hê jî daday maye.

Li gor wê zelalkirina jorîn, xûya dibe ku Dr. Qasimlo çiqas bizanebûn, girîngiyeke stratejîk daye mijara demokrasiyê û di xebata xwe de hem ji bo cihgîrbûna kultûra demokrasiyê di nav PDKÎ û di nav civakê de, hem jî bo avakirina sîstemeke demokratîk a deshelatdariyê di Îranê de, kedek mezin daye.

Ew hişmendî û lêzaniya Dr. Qasimlo ku tim digot "Xirabtirîn demokrasî baştir e ji baştirîn dîktatoriyê" bandoreke mezin li ser civakê û bixasmanî tevgera rizgarîxwaziya netewa Kurd di Îranê de danîbû, û herwiha hêz û partiyên Îranî yên dijberî rejîmê jî, Qasimlo wekî karîzmayekê di nav Kurdan de didîtin.

Ji ber wê rola mezin a ku Dr. Qasimlo di xebata li dijî dîktatoriyê de hebû û roj bi rojê zêdetir karîbû bibe adresa pêkanîna eniyeke demokratîk bo xurtkirina xebata li dijî rejîma Îranê.

Lewma rejîma Îranê jî ew wekî metirsiyeke mezin bo deshelata reş a xwe didîtin



û pîlana terorkirina Dr. Qasimlo danîn, û li rêkeft 13.07.1989an Dr. Qasimlo li Nemsayê li ser maseya diyalogê a ji bo çareseriya pirsa Kurd bi rêya siyasî û demokrasiyê, ji aliyê diplomat-terorîstên ser bi rejîma Îranê ve hate terorkirin.

Bi vî awayî terorkirina rêberekî wiha demokrat û aştîxwaz ne tenê xisarek bû ji bo neteweya Kurd, belku xisareke mezin bû bo hemû hêz û aliyên demokrat û aştîxwaz li ser astê Kurdistanê bitaybetî û Îranê bi giştî.

Çimku kesayetiyekî wiha ne tenê dikarî hêzên demokrat li dijî rejîma Îranê li dewra hev kom bike, belku bo cihgirkirina demokrasiyeke rasteqîne a bihêz bo siberoja Kurdistan û Îranê jî dikarî gelek bibandor be.

# Wezareta Derve ya Iraqê şewitandina Balyozxaneya Swêdê şermezar kir




Wezareta Derve ya Iraqê bi tundî şewitandina Balyozxaneya Swêdê ya li Bexdayê şermezar kir ku sibeha îro Pêncşemê hat şewitandin.

Wezareta Derve ya Iraqê di daxuyaniya xwe de dibêje, şewitandina Balyozxaneya Swêdê ya li Bexdayê dikeve di çarçoveya êrîşa ser nûneriyên dîplomatîk de û metirsî li ser ewlekariya wan e.

Hikûmeta Iraqê daxwaz ji dezgehên ewlekarî yên pêwendîdar kir ku lêkolîneke bilez bikin, tedbîrên tund ên ewlehiyê werbigirin, hûrgiliyên bûyerê eşkere bikin.

Wezareta Derve tekez kiriye ku hikûmeta Iraqê aliyên ewlekariyê yên pêwendîdar erkdar kirine daku lêkolîneke bilez bikin û tedbîrên tund ên ewlekariyê werbigrin û hûrgiliyên bûyerê eşkere bikin.

Li gor daxuyaniyê, di heman demê de hatiye xwestin, nasnameya kesên ku ew kar kirine were diyarkirin û li gorî yasayan lêpirsînê bi wan re bê kirin.

Berbanga îro li Bexdayê xwepêşanderan careke din bi ser Balyozxaneya Swêdê de girtin û beşek ji balyozxaneyê şewitandin.

Bûyera serdegirtin û şewitandina beşek ji Balyozxaneya Swêdê ya li Bexdayê piştî wê yekê hat ku hikûmeta Swêdê destûr daye îro xwepêşandanek li ber Balyozxaneya Iraqê ya li Stockholmê bê lidarxistin û têde Qurana Pîroz bê şewitandin.

Roja Çarşemê 28ê Hezîranê di yekem roja Cejna Qurbanê de jî welatiyekî Iraqî yê bi navê Selwan Momîka li ber Mizgefta Stockholm a paytexta Swêdê di bin tedbîrên tund ên polîsan de, pirtûka pîroz a Misilmanan, Quran şewitandibû.

Bûyera şewitandina Quranî li Swêdê, bûbû sedema gelek bertek û karvedanan li cîhanê, lê bertkên herî tund li Iraqê çêbûn.

## Nerîna Lîderan



**“Xalid Ezîzî:”**

Serokê Komîsyona Azadiya Olî ya Navdewletî: Divê Rojava siyaseta xwe ya li gel Îranê ji nû ve binirxîne



**“Xaxam Abraham Kûper”:**

Bikaranîna xerab a hişê dest çêkirî “wêraniyek nne çihê baweriyê” bi cih dihêle.



**“ Donald Trump :”**

Ez dikarim di rojekê de şer bi dawî bikim.



**“John Kirby:”**

Piştî kuştina Jîna_Emînî û xwepêşandanên gel, êdî divê gelên Îranê bi xwe biryara xwe bidin û jin jî cilên xwe hilbijêrin.”

# Rastgir û nijadperest, fêmînîstan wek dujminên xwe dibînin



**N: Eskender Ceiferî**

Di 9-ê Çiriya 2019-an de, têrorîstekî êrîşkar ê rastgir li Sachsen-Anhalta Almanê gulle berdan ser du kesan bi navên Jana L. û Kevin S. û di encamê de wan jiyana xwe ji dest da. Bi giştî, wî hewl da ku 69 kesên din jî bikuje. Armanca wî ya yekem kenîseya civata Cihûyan a li Wasserturm li bajarê Halle Saale bû. 52 kesên ku bikuj dixwest li wê kinîştê bikuje, li wir karên xwe yên olî dikirin.

Roja 9-ê Çiriya 2019 ji hêla Cihûyan ve wekî Yom Kippur dihat naskirin; Cejna herî bilind a salê ya Cihûyan e ku li kinîştê tê pîrozkirin. Bikuj agir berda derî lê nekarî xwe bigihîne kinîştê. Hevdem wî têrorîstî, Jana. L. di kolanê de di demekê de kuşt ku wê dixwest bi wî terorîstî re biaxive.

Sûcdar dev ji êrîşa li ser kenîseyê berda û berê xwe da Ludwig-Witcher-Straße. Di vîdyoyeke zindî de, wî diyar kir ku dixwest mirovên ku ew difikire koçber in, bikuje. Wî li xwaringeha Kiez jî zilamek bi navê Kevîn. S. ku xwarin jê re dihat amadekirin, kuşt.

Niha çalakvanên Almanî dibêjin tevî ku ew hatiye sizakirin jî, lê nabe bi ti awayekî dosye bê girtin.

Ew di 21-ê Çileya Pêşîn a 2020-an de bi girtîgeha hertimî hate sizakirin; bi vî rengî divê ew heya hertim binçavkirî be.

Çalakvan didin xuyakirin ji bo parastina civakê, divê tim kar li ser vê dosyeyê bê kirin da ku nijadperestî berfireh nebe.

Kujer, nerînên rastgirane û tundrew hebûn. Wî nêrînek rastgir a cîhanî hebû ku di qada civakê de ji ravekirinên derewîn pêk tê. Ew raman, weke faktorên afirandina kirîzê û metirsîdar têne hesibandin. Naskirina van ramanên bîrdozî yên rastgir ji bo dijatiya wan girîng e!

Ji bo çalakiya li dijî binpêkariyên mafên mirovan û berfirehbûna wan a civakî divê hevgirtîbûn hebe.
Çalakvan hertisa telezê dikin ku civaka Alman bi newekhevî, pêşbaziyek ne tendurist û valahiya nav civakê re rû bi rû ye. Ev ji ber pergala aborî ya kapîtalîst û pergala siyasî ya têkildarî vê mijarê ye.

Di dêmokrasiya parlamentoyê de, hêza biryara siyasî bi piranî bêyî bandora rasterast a giştî ya civakê tê rêkûpêkkirin. Encam, newekheviya aborî û civakî ye; Ji ber ku li ser karûbarên aborî û civakî kontrola dêmokratîk tune ye.

Di nerînên cîhanî yên rastgirî yên têrorîstê bajarê Halle Saale de, dijberiya Cihûyan, nîjadperestî û dijatiya tevgerên jinan mijara sereke ye. Ramana tundrê ya rastgir hin beşên civakê mîna Cihû û koçberan,weke berpirsyarên nebûna ewlehiyê û mercên dijwar ên jiyanê binav dike. Li gor vê ramana rastgirî, bi cudakariya nijadî û dûrxistina nijadên din, rasgir dikarin ji bo xwe, dabînkirina çavkaniyên civakî, dahat, xanî û mercên jiyanê yên baş misoger bikin.

Li gor îdeolojiya nijadperestiyê, ew li vir di rewşeke nebaş de derbas dikin, rastî tepisandin û mercên jiyanê yên dijwar tên.

Ew, dijatiya Cihûyan, newekhevî, û pêşbaziyeke ne tendurist wekî encama bernameyên veşartî yên civaka veşartî dibînin. Li şûna ku pergala civakî ji gilî û gazincên heyî re tawanbar bikin, ew fikirîn ku ji ber kiryarên hin kesan rastî vê rewşê hatine.

Ev demek dirêj e ku fikra ku Cihû




hêza xwe ya veşartî bikar tînin, heye. Bîrdoziya dijberê Cihûyan bû sedema kuştina bi mîlyonan Cihûyan ji hêla Sosyalîzma Netewî ya Alman ve, ya ku di dema Hîtlêr de di bin biryara wî de pêk hat û hîn jî berfireh e.

Di heman demê de dijberên Cihûyan ramaneke rastgirane hene ku li gor nerîna wan, Cihûyan femînîzm û sosyalîzm dahênane. Ew, van ramanan bikar tînin da ku hêza xwe destnîşan bikin û nirxên kevneşopî di civakê de tune bikin. Fêmînîzm wekî tevgerek azadiyê nayê destnîşankirin, lê ji hêla rastgiran ve wekî sedemek ji bo têkdana hevgirtina civakê tê dîtin. Dijberên fêmînîzmê dixwazin dewletekê bidomînin an vegerînin ku zilam tê de serdest in.

Ew di dawiya daxuyaniya xwe de herwisa dibêjin: Em di vê baweriyê de ne ku divê darizandina êrîşa rastgirî ya 9-ê Çiriyê bi bidawîbûna darizandinê re bi dawî nebe.

Ew gotûbêjek civakî ya bi bîrdoziya kujer û mercên civakî ye ku vê gengaz dike.



# Rojhilatê Firatê di navbera Moskow û Waşîngtonê de



N:Ebdûlazîz Qasim

Digel liv û bizavên dîplomatî û leşkerî yên herêmî û navneteweyî, çi civîn û hevdîtinên dibin di navbera dewletên erebî yên cîranên Sûriyayê de ji bo rê bigirin li pêşiya qaçaxçiyên "Captagon", ku jêderê wê ji Sûriyê ye, çi yên herêmî bi taybetî yên Tirkiyê û Îranê bo hin welatên Erebî, tevlî berdewamiya şerê gerim yê li Ukrayna lê wisa diyar dibe ku wê şerekî sar yê nû destpê bike her wekî li gorî daxuyaniya civîna vê dawiyê ya NATO li Vilnius, paytexta Lîtvanya, nemaze ku berfirehkirina NATO bi tevlîbûna çend dewletên din, herwisa vekişandina Moskow ji peymana hinardekirina genimê Ukraynayê ya bi rêya derya reş, ku Moskow bi awayekî fermî Neteweyên Yekbûyî, Tirkiye û Ukraynayê agahdar kir ku ew rêkeftina hinardekirina genim nû neke, wisa diyar dike ku wê nakokî di navbera Rûsya û Amerîka zêdetir bibin, dibe ku Tirkiyê xwe pirtir nêzîkî Amerîka bike, lewra gera serokkomarê Tirkiyê ji bo hin welatên Erebî tê di vê çarçoveya nû de ya ku diyardeyên wê roj bi roj zelaltir dibin, lê li gorî hin çavdêrên siyasî ku Tirkiyê nikare bi hêsanî têkiyên xwe digel Rûsiyayê qut bike ji ber hewcedariya wê ya zêde bi gaz û nefta Rûsiya û herwisa ji ber rêkeftinên wê yên li ser Sûriyê yên digel Rûsiya û Îranê.



Hevdem ku li vê dawiyê li her du rexên rûbarê Firatê li rojhilatê Sûriyê oparsyonên leşkerî di navbera hêzên Amerîkî û hêzên Rûsiya de zêde dibin û zêdebûna nakokiyan di bavbera wan de hişyariyê dide li ser îhtîmala pevçûneke serbazî ya berfireh li herêmê, ligel aloziyên asmanî di navbera hêzên hevpeymaniya navdewletî û hêzên Rûsî li seraserî Sûriyê, zêdebarî zêdebûna bizavên leşkerî yên Amerîka li Kendavê ji bo rê bigire li zêdegaviyên deryayî yên Îranê, ku li gorî Ajansa Associated Press li ser zarê karbidestekî pilebilind yê Pentagonê ragihand ku Amerîka dê di nav 3 rojan de firokeyên F-16 bişîne herêma Kendavê.

Lê Sûriya û bi taybetî navçeya Dêrazorê û rojhilatê Firatê heta asyekî dikarin wê jî bi hêleke gerim binav bikin, ku li gorî hin nûçeyan ku li deverên Dêrazorê li rojhilatê Sûriyê liv û oparsyonên leşkerî yên hêzên Amerîkî û (HSD) ji aliyekî ve û hêzên rêjîma Sûriyê û milîsên Îranê ji aliyê din ve zêde dibin, ku di çend rojên derbasbûyî de, hêzên Amerîkî û HSDê hin hêzên xwe vekişandine ji çeperên parêzgeha Reqayê ber bi kompaniyên petrolê yên Dêrazorê, di heman çarçoveyê de, berpirsekî Pentagonê got ku Amerîka nîgeraniya xwe dide li hember bihêzbûna peywendiyan di navbera Îran, Rûsya û Sûriyê de, û ragihand ku welatê wî li ser çend bijardeyên leşkerî dixebite ji bo rûbirûbûna zêdebûna oparsyonên esmanî yên Rûsyayê li esmanê Sûriyê, Heman berpirsê Pentagonê diyar kir ku bi zêdebûna hevkarî û hevahengiya di navbera Moskow, Tehran û hikûmeta Sûriyê de, ji bo zextê li Amerîkayê bikin ku ji Sûriyê derkeve û amaje bi wê yekê jî kir, ku Waşîngton dest ji ti navçeyekê li Sûriyê bernade û dê berdewam be li ser şerê xwe li dijî DAIŞê li wan navçeyan.

Lewra bi dîtina min, hewcedariya Amerîka wê bi hêzên HSD zêdetir bibe, û herwisa Tirkiya jî neçar dibe ku şerê xwe li dijî HSD rawestîne, lewra ev yek dibe derfetek bo hêzên HSD û rêveberiya xweser û partiyên kudî ku bi cidî bixebtin ji bo bidestxistina hin mafên neteweyî bo gelê kurd yê Rojavayê kurdistanê.

# Nivîskarû helbestvanê Kurd Mehmûd Sebirî yê xelkê Rojavayê Kuridstanê çû ser dilovaniya xwe

Roja Sêşemî 27ê Pûşperê Mehmûd Sebirî nivîskar û helbestvanê Kurd û yek ji avakerê YekîtiyaNivîskarên Kurdistana Sûriyê û bibû endamê Partiya Demokrat a Kurdistana Sûriyê, lê di demên dawiya jiyaba xwe de kesayetekî serbixwe bû û li bajarê Hisicê ji ber nexweşiyê çû ser dilovaniya xwe.

Jiyannameya Mehmûd Sebrî 1937-2023

Mehmûd Sebrî (Evîndarê Xemgîn) di sala 1937ê de, li gundê Çetela Kîkan, yê ser bi devera Dirbêsiyê li Rojavayê Kurdistanê jidayîk bûye, zarokîniya xwe li gundê Melek, devera Dirbêsiyê – derbas kiriye. di heftsaliya xwe de, li nik melayê gund fêrî xwendina Erebî bûye û paşî wergirtina bawernameya Sertefîka, li Dêrazorê 3 salan mamostayî kiriye.

Di sala 1965an de bawernameya Bekelorya bidest xistiye, li sala 1970ê de bawernameya Lîsansê ji zankoya Şamê, beşê mafnasî û yasayê bidest xistiye.

Berhemên Mehmûd Sebrî yên kurdî û çapbûyî ev in:


1- dîwana (nîgarên kul û derdên jiyanê).

2- dîwana (doza giran) beşê yekem.

3- Dîwana (doza giran) beşê duwem.

4- Şirovekirina ristên Cizîrî bi navê (geştek li nav baxê ristên Cizîrî) beşê yekem.

5- Şirovekirina ristên Cizîrî bi navê (geştek li nav baxê ristên Cizîrî) beşê



duwem

6- Nerînek di terazûya ristên kurdî de.

7- Hin hest û ramanên netewî û civakî.

8- Nasnameya Kurdî li Sûrya.

Mehmûd Sebrî sernivîserê Govara Xunav bû, û endamê komîta amedekar ya mihrecana Helbesta kurdî bû û hem jî endamê komîta rexnegeriya helbestan bû.

Mehmdê Sebrî li sala 1959 de tevlî partiya democrat a kurdistana Sûriyê bûye.

Her wisa yek ji damêzrenêrê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriya bû (YekîtiyaNivîskarên Kurdistana Sûriya).

Li 18.07.2023 li bajarê Hisiçe- Rojavayê Kurdistanê di jiyê 86 saliyê de ji ber nexweşiyê koça dawiyê kir.

Qamişlo 19.07.2023

Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriya

# Xewina min



**N: Vênûs Fayq**
**W: Hesen Mukerem**

Min hert im wisa hizr kiriye ku ti mirovek min teşwîq dike an rê dide bi min ku ti pisrgirêkek di jiyana min te nebûye. Belkî bo min hertim hizr bûye ku ti mirovek rê li ber min digire, ku gur û coşeke zêdetir bide bi min da ku jêra bidim selpandin ku ev şaş e, ya ku bi wî tê encam dan ez jî dikarim encam bidim, min ti demî xwe li pêş zilam de jin hesab nekiriye, belkî her tim însan bûme.

Di hizra min de têkoşîn bo maf û wekheviya jinê, nabe wek fîmînîst bê pênasekirin, belkî dibe têkoşîneke mezintir be li pêxema mafên mirovan de, vê demê dikare jinê di nav ajotvaniya însaniyeta xwe li hember zilam de pênase bike.. Ev yeka jî bingeheke perwerdehiyê ya xort heye.

Di malbata me de, her dem pirtûk li nan û xwarinê zêdetir bûye, û dema ku min serê xwe hundirî pirtûkê dikir, xwarina nan jî ji bîra min nedima, nek tenê xwandina pirtûkan, belkî di mala me de bi çavek rêz û hurmet ve temaşeyî hemû cureyên din yên hunerê tê kirin.

Rehmetî bavê min rewşeke wisa ya perwedehiyê daye bi min, ku min wisa hesab dikir, tevahiya civakê wekî mala me wisa ye.. Lê, dema ku mezin bûm û derkevtim derveyî malê û li Bexdaya paytext min xwandina xwe berdewam kir, vê demê min fêm kir ku mala me tevahiya civakê nin, di hinek rewşan de tûşî şokê dibûm, wek vê ku jinek bi newekheviyê rizamend be û dawîn hêvî û xewinê jiyana wê, zewac û dayîk bûn be, ezê ku hîn kirbûm, zewac û dayîkatî tenê qonaxek in di dewreya mezin a jiyana min de, ku dibe pênaseya paşperdeya vê be. Karesateke mezin e ku hîn hin jin hebin ku wiha hizr bikin, eger zilam nebe mal birêve naçe û avedan nabe.

Min ti carî xewin bi vê yekê ve nedîtiye ku jin serbest be, çimkî bixwe bi serbestî jidayîk dibe, xewina min ev yeka ye ku zilam serbest bin û rêz li jinê bigirin.

Çimkî zilam in koleyên edet û ayînan, dema ku karîn wek mirov hizr bikin, vê demê dikarin wek mirov temaşeyî jinê bikin.

Hemû ev cudahî û dûrxistin û li qerax xistina jinê li warên girîng yên civakê de bingeheke ayînê heye.

Eger ez axavtinên xwe azad behs bikim, ti ayînekê, mafê tevaw û wekheviya zilam û jinê di gel nedaniye. Her dema ku ayîn dest li ser dewlet û jiyana taybet a xelkê rakir, vê demê jin dibe xwediyê pêgehek mirovî ya kêrhatiya xwe.

Dawîn car bi kevtina desthilatên serkutkar civak rizgar nabin, belkî bi wegerandina ayînê bo hundirî mizgeftan û dakitana vê hişê ku bi çavek kêm temaşeyî jinê dike, vê demê civak rizgar dibe û pêş dikeve.

çandek heye hîn jî şerfê li nav jinan de pênase dike, di demekê de, eger şeref hebe, di hiş, wijdan û exlaqe de ye, hem bo jinê û hem jî bo zilam.

# Li Kotolê jinek kêm temen dawî bi jiyana xwe anî

Pêka rapora malpera Mafê Mirovî ya Hêranayê, roja Pênçşemî 23`ê Pûşperê, jina bi navê Rahile Rahdar a temen 15 salî ya xelkê gundê Razî ya Bexşa Kotola ser bi bajarê Xoyê ku qurbaniya zewaca di temenê kêm de bûye, bi sedema tundîtîjiyên hundirî malbatê dawî bi jiyana xwe aniye.

Di berdewamiyê de vê çavkaniya haydar diyar kiriye ku, Rahile Rahdar keçika temen 15 salî 8 mehan beriya niha di temenê 14 saliyê de zewcîbûn û herwisa xwîşka wê jî her bi sedemên tudûtîjiyên malbatî dawî bi jiyana xwe aniye.

Pêka roporên meydayên hundir, li Îranê tenê di roja 13`ê Cozerdana îsal de 4 jin û keçikekê, bi sedemên zewaca di temenê kêm de û tundtîjiyên malbatî dawî bi jiyana xwe anîne.

Di destpêka îsal de heya niha 10 jin û keçekê her bi sedemên zewaca di temenê kêm de û tundûtîjiyên malbatî canê xwe ji dest dane.



## Pîranşar; Şîdeta nav malê bû sedema kuştina keçeke 15 salî ji aliyê bavê xwe ve

Roja Înê 16'ê Pûşpera 1402'an a Rojî de, li gundê "Zêwe" a Pîranşarê, keçeke temen 15 salî ya bi navê "Zîlan Îvez" ji aliyê bavê xwe ve, li gundê "Zêwe" a Pîranşarê, ji aliyê bavê xwe ve hat kuştin.

Li gor çavkaniyek agahdar ku ji Kurdpayê ragihandiye; Ev keça temen 15 salî demjimêr 9:15 sibeha roja Înê li dû tundûtûjiyên nav malbatê û piştî îşkence û lêdanê ji aliyên bavê xwe "Ebdulselam Îvez" bi sîlahê hate kuştin.

Çavkaniya agehdar a Kurdpayê zêde jî dike; Zîlan pêşî ji aliyê bavê xwe ve ji banê avahiyê hatiye darvekirin û piştre bi du guleyan hatiye qetilkirin.

Ebdulselam Îvez piştî cînayetê xwe radestî polîsan kir.

Ev çavkaniya agehdar îşare bi vê yekî jî dike; Bavê vê keça 15 salî berê jî tûşî tundûtûjiya nav malbatê li ser endamên malbata xwe bûye û di salên borî de keça xwe ji xwendinê bêpar kiriye.

Zîlan Îvez di 30'ê Xezelwera 2006'an de li Pîranşarê ji dayik bibû.

Di rojên derbasbûyî de li Sinê bavekî ku bi madeyên hişber ve girêdayî bû du keçên xwe yên 3 û 5 salî bi awayekî hovane kuştin.

Di deh salên borî de, Kurdpa bi navînî 30 haletên kuştina jinan li Kurdistana Îranê tomar kiriye.

Evîn Mistefazade, berpirsa navenda amaran û berdevka Kurdpayê ragihand; Divê ev qas li ser kuştina jinan li Kurdistana Îranê berevajî gotara hukûmetê were hesibandin; Ew e ku jinkujî encama faktorek yekane ya "rûmet" an "çandî" ye, ew ne wekî xwendina hukûmetê ye, ku bi awayekî xwedin, hukûmetê ew ji hêla siyasî û civakî ve bikar anî da ku berpirsiyariya xwe ya di derheqê cûdaxwaziyê de bihêle. Qanûn û zagonên tundiyê yên li ser jinan, jinên Kurd û ji aliyê din ve jî nîşan didin ku Kurd di cewherê xwe de xwedî çanda jinkujiyê ne, lê çand ne mijareke statîk e û li gorî şert û mercên civakî-siyasî-aborî yên civakê pêvajoya xwe didomîne.

Her wiha di salên derbasbûyî de diyardeyên civakî yên madeyên hişber, xizanî, bêkarî û … hwd ji faktorên girîng ên tundûtûjiya nav malê, kuştina jinan û zêdebûna tundûtûjiyê li ser asta civakê bi giştî û diyardeyên din ên jinkujî û xwekuştinê bûn. ji bo jinan ne tenê bi mexdûrên pasîf re têkildar in, di rastî de gelek bûyer ji bo bidestxistina maf û daxwazên xwe û di encama hişyarbûnê de rastî tundiyê hatine.

# Rêberek rewşenbîr û pragmatîst



N: Elî Monezemî

Dr. Qasimlo rêberek rewşenbîr û pragmatîst bû. Rewşenbîrî girêdayî bi hişmendî û aqil e ku ew jî girêdayî bi hizrkirin, naskirin û şirovekirinê (heger'anînê) ye.

Qasimlo Rewşenbîr bû. Yanî xwediyê hişmendî, nasîn û şiroveya xwe bû liser pirsên cudacuda.

Ew herwisa rêberek pragmatîst bû. Yanî pîvanên Qasimlo bo her raman, siyaset yan hizrekê, asta cîbicî kirina wan hizran li pratîkê de bû. Liber hindê jî wî digot ku «teorî dibe xwe tevî rastiyê rêk bêxin».

Qasimlo her ew perspektîfa bikar dianî di xebata xwe ya siyasî de û destnîşan dikir ka kîjan hizr yan armanc dibe li kîjan qadê de (netewî, herêmî yan navnetewî) xebat bo were kirin.

Lê qada sereke ya xebata Qasimlo Kurdistan bû û ewî ew qad bikar dianî ku kartêkeriyê çêbike liser xebat di qada herêmî û qada navnetewî de û herwisa kartêkeriya xebat û siyasetê di wan qadan de liser xebat û siyaset li Kurdistanê de fam dikir û hevsengî di navbera wan de pêk dianî. Yanî Qasimlo bi dil û mejiyek kurdistanî difikirî û dixebitî. Lê eger wisa be, pirs ewaye ku gelo çima têkoşîna xwe di çarçoveya sînorên Îranê de pênase kir? Nêrîna wî hember Îranê çi bû?

Bo ku em hizrên siyasiyên dr. Qasimlo baş fam bikin, pêdiviye ku em du faktorên sereke liber çav bigrin: ew paradîgma ku Qasimlo têde siyaset dikir û ramanên ku Qasimlo bi axaftin, nivîskî yan jî çalakiyên xwe dane xûyakirin.

Bi liber çav girtina wan faktorên han, derdikeve ku Qasimlo bi hemû hebûna xwe ve kesek kurdistanî bûye. Lê paradîma ku ewî tê de xebat dikir, ew neçar hêşitiye ku giraniya siyaset û çalakiyên xwe bêxe ser Rojhelata Kurdistanê û Îranê.

Qasimlo hilbijartina wê mêtodê bo rizgariya neteweyî li nivîsên xwe de bi başî ronkiriye.

Bo Qasimlo azadî proseyek berdevam, bênavbir û bêdawîtî bû. Ber hindê jî xebat bo otonomiyê bo wî nedihate wateya xebat nekirin bo serxwebûnê.

Lêbelê, bo wî xebat bo otonomiyê dikarî fersenda xebat bo serxwebûnê xurttir û berfirehtir bike.

Li ew qonaxa ku Qasimlo tê de xebat dikir, bi sedema zaf faktorên dereke û navxweyî, bijardeyên zêde çinebûn.

Qasimlo ew bijarde bo xwe kire armanc ku îhtimal hebû pêk were û realîze bibe. Bi wê wateyê, liber ku xebat bo azadiyê zehmet bû, Qasimlo armanca xwe nediveşart û penah nedibire ber keleha derûniya xwe. Ewî armanca xwe jî nedixwat dev jê berde ku li nemana armanca xwe, bi şêveyeke qelp û pûç xwe azad hîs bike. Lewra Qasimlo şiroveyek nû li îranîbûnê anî holê ku tewî şiroveya neteweya serdest lihev hicê bûn. Ewî îranîbûn li yêketiya dilxwazane a navbera hemû pêkhateyên xwecî di nav tixûbên Îranê de dizanî ku hemû ew netewe û grûpên cihêreng bi maf û erkên wekhev di pêkanîna wê de beşdar bûn.


Bi wê wateya nû, Îranîbûnê tixûbên azadiya me tengav nedikir. Yanî serdestiya yên din qebûl nedikir û azadiya me li nemana serdestiya yên din de didît û berbestên fîzîkî û derûnî liser riya maf û azadiya xelkê Kurdistanê bi xasma hebûna hêzên dagirker liser xayiya Kurdistanê red-dikir û dixwast ku jiyana me dûr be li hemû wan berbestên ku bi sedema kurdbûnê em rastî wan hatine.

Yanî têkşikandina wê pergala dagîrkariyê ku têde azadiya xelkekê liser çarereşî û belengaziya xelkên din hatibû danîn.

Qasimlo bo damezirandina pergalek nû û dadperwerane ku bersivderê wê wateya nû li îranîbûnê be, cehd dikir ku pergalek demokratîk li Îranê de were damezirandin.

Liber ku demokrasî li hêlekê antîtêza dîktatoriyê bû û li hêlek din jî antîtêza şer û pevçonên çekdarî.

Bo gihîştin bi wê yekê û realîzekirina wê hizrê di pratîkê de jî, ewî hevxebatiya hemû neteweyên bindest û hêzên xebatkare demokrat pêdivî dizanî. Hevxebatiyek ku bi xebata sivîl û çekdarî mil bi milê hev, bikarin li pêş de rêjîma kevneperest, dîspotî a sedsalên navîn, rêjîma diktator û şantajçî, ajavegêr û terrorist û derevkar, şerxwaz û merivkuj û neberpirs a Îslamî a Îranê hiloşînin û li şûna wê de sîstemek dêmokratîk ava



bikin ku mafê netewî yên hemû neteweyên bindest ê Îranê desteber bike.
Ku wisaye, Qasimlo Azadî li nemana dîktatoriyê, desteberbûna mafê xwebirêvebirina neteweyî, azadiyên takekesî û siyasî û dadperweriya civakî de didît. Azadiyek ku li hemû astên jiyana takekesî û jiyana giştî de, dijî serdestiya yên din bû. Liber wê hindê jî Qasimlo digot ku "Azadî keramet û kesayetiyê dide meriv". Tinê li civakeke demokrat, pirreng û azad de ye ku tak û komên cudacuda dikarin rastiya kesayetiya xwe biceribînin û bigihîjin armancên xwe.

Li civakek han de ne dîktatoriya hikûmetî û ne jî dîktaroriya majorasiyonî nikare hebe û zext û givaşê bêxe ser takekesan yan kom û grûpên cihêreng û cudacuda.

Peydakirina formolekê bo xebata pir-alî ku bikare bersivderê wan hemû pirs û aloziyan be, rêberek xwedî şiyan û hizrên bilind hevce bû ku li kesayetiyek wek Qasimlo dihat.

Em bi hilkefta 34'min salvegera şehadeta Qasimlo û rêhevalê wî, wan bi bîr tînin û soz didin ku heya gihîşin bi armancên wan, emê li ser riya doza wan berdewam bin.

## Rejîma Îranê li hin bajarên Rojhilatê Kurdistanê rê nade ku welatî navên Kurdî li ser zarokên xwe danên

Pêka rapora Ajansa Mafê Mirovî ya "Kurdpa" yê welatiyekî xelkê bajarê Mehabadê yê bi navê "Elî Nadirî" bi belavkirina girte vîdyoyekê ragihandiye ku piştî derbasbûna 62 rojan heta niha nekariye ev navê ku bixwe dixwaze li ser zarokê xwe danê.

Navbirî dixwaze navê kurê xwe danê "Ajiman" li îdareya Tomarkirina Barê Kesayetiyê li bajarê "Mehabadê" vî navî qebûl nakirin û gotine ku Kurdî ye û di nava sîstema me de nehatiye tomarkirin û divê serdana navendên pêwendîdar li bajarê Urmiyê û Tehranê bê kirin.

Herwisa "Elî Nadirî" ragihandiye ku tevî çendîn caran pêwendî giritn bi navendên pêwendîdar li Tehran û Urmiyê heta niha bersiva vî nehatiye dan û daxwaza vî bê dana şiroveyan hatiye redkirin.

Yek ji sereketirîn mafê her dayîk û bavekê ye ku bixwe navê zarokên xwe hilbijêrin, lê li Rojhilatê Kurdistanê ev yeka jî, ji aliyê deselata hakim tê binpêkirin û gelek kes hene ku du navan ji zarokên xwe re hildibijêrin yek ya ku di nasnameya wan de tê tomarkirin yek jî ku di nava malbat û civakê de jê re tê gotin.

Mînaka herî berçav navê "Jîna Emînî" bû ku ji ber Kurdîbûna "Jîna"yê malbata wê neçar bûn ku di nasnameya wê de navê wê bikin bi "Mehsa"

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Di heyama 10 salan de nêzî 5 Hezar kes li Îranê hatine darvekirin

Di 10 salan de rejîma Îranê nêzî 5 Hezar kes îdamkirine ku ev nîşana vê yekê ve ku rejîma Îranê xwediyê zêdetirîn rêjeya îdam kirinê li cîhanê de ye

Pêka rapora Organa Komek ji Çalakvanên Mafê Mirovî ya Îranê "Hêrana"yê di heyama 10 salên derbasbûyî yanî li sala 2013an heta 2023 bi gelemperî 4 Hezar 829 kes li Îranê ji aliyê rejîma Îranê ve hatine îdamkirin.

Herwisa "Hêrana"yê daye zanîn ku, piraniya kesên ku hatine darvekirin zilam bûne û nîviya wan kesan bi tohmetên pêwendîdar bi kirîn û firotina "Madeyên Hişber" berê hatibûne binçavkirin û cezadan herwisa eşkere jî kiriye ku 41 kes jî zarok bûne û di bin temenê 18 saliyê de bûne.

Rêjeya amaran bi berdewamî zêde dibe bi taybet li îsal de ku li meha Banemerê heta niha aliyê kêm her heftiyê 10 kes tên darvekirin.

Li derheq îdamên Îranê li sala 2022an "Mehmûd Emîrî Muqedem" Serokê Saziya Mafê Mirovî ya Îranê daye zanîn ku di 6 mehan de 251 kes li Îranê ji aliyê rejîma Îranê ve hatine îdamkirin.

Herwisa ragihandiye ku di nava kesên hatinî îdamkirin de zêdetirîn qurbanî xelkê Belûç bûne ku dike %27.

## Seqiz; Silêman Ebdî cezayê girtîgeh û lêdana qamçiyan bi ser de hate sepandin

Roja Duşemî 26`ê Pûşperê, Silêman Ebdî, endamê Sendîkaya Mamostayên Kurdistan – Seqizê, ji aliyê taya 105 a dadgeha Kêyferî ya bajarê Seqizê ve, bi tohmeta "alozîxistin li aramiya giştî bi rêya beşdarîkirin li kombûna neyasayî li goristan Ayçî", 8 meh girtîgeh û 70 derbeyên qamçiyan bi ser de hate sepandin.

Dadgehê, 8 meh girtîgeha wî çalakvanê sendîkaya mamosteyan bi 270 demjimêr wanegotin bo kesên komîteya Îmdad guherî û cezayê 70 derbeyên qamçiyan jî bo heyama 2 salan ragirtiye.

Roja Dûşemî 21`ê Xakelêweya 1402 a Rojî, Silêman Ebdî bi danîna barimteya 200 milyon Tumenî, bi awayê demkî û heta dawîhatin bi qonaxên dadweriyê, ji girtîgeha bajarê Seqizê hate azadkirin.

Roja Çarşemî 16ê Xakelêweyê, navbirî piştî bi dawîhatina qonaxên lêpirsînê, ji girtîgeha îdareya Îtila`at a bajarê Sinê, bo girtîgeha bajarê Seqizê hate veguhastin.

"Silêman Ebdî" li 28`ê Reşemeya 1401 a Rojî ji aliyê hêzên ewlehî ve bê nîşandana belgeya dadgehê, binçav kiribûn û bona lêpirsînê bo girtîgeha îdareya Îtia`at a bajarê Sinê, veguhastibûn.

Hêzên ewlehî li meşa vekolîna mala "Silêman Ebdî" de, dest bi ser mobayla wî û mobaylên endamê malbata wî de girtibûn û digel xwe biribûn.

Di meha Xermanana 1401 a Rojî de jî, biryara sekinandina lipeykevtin a li pey Silêman Ebdî, ji aliyê taya 2 a dadyariya dadseraya Giştî û Şoreşê hatibû dan.

Roja Çarşemî 25`ê Cozerdana 1401 a Rojî, ew çalakvanê sendîkayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û roja Şemî 4`ê Pûşpera 1401 a Rojî, bi danîna barimteyê û bi awayê demkî, heta dawîhatin bi qonaxpên dadweriyê, ji girtîgeha bajarê Seqizê, hatibû azadkirin.

## Kolberê bi navê Mihemed Salih Qenberî ji Ciwanroyê bo nexweşxaneyeke Tehranê hat veguhastin

Mihemed Salih Qenberî kolberê xelkê gundê "Sefî Ava" a ser bi navçeya Ciwanroyê, ji ber rewşa wî ya giran bo nexweşxaneyeke Tehranê hat veguhestin.
Li gor çavkaniyeke agehdar bo Kurdpayê, îhtimala ku kolberê han lingê xwe bo hertimî ji dest bide, ne dûr e.

Ev kolber roja Şemî 24'ê Pûşperê, li sînorê "Tete" ya Hewramanê, ji ber gulleyên hêzên hikûmetê ji lingê xwe yê rastê bi giranî birîndar bû û ji bo çareseriya pizîşkî bo nexweşxaneya Îmam Riza Kirmaşanê hatibû veguhastin.

## Cezayê bidarvekirina welatiyekî xelkê bajarê "Hersîn"ê bi rê ve ço

civîna cezayê destpêkî ya mamosta Arman Sadiqî, pêşminêjî Înê yê gundê "Husênî" a bajarê Dêwolanê û rêveber û mamostayê Sibêdeha roja Sêşemî 27`ê Pûşperê, cezayê bidarvekirina binçavkiriyek ê bi navê "Seîd Elmasî", xelkê bajarê "Hersîn"ê ser bi parêzgeha Kirmaşanê, li girtîgeha navendî ya bajarê Hemedanê, bi rê ve ço.

Ew binçavkiriyê han li sala 1396 a Rojî, bi tohmetên girêdayî bi madeyên hişber, hatibû binçavkirin û ji aliyê berpirsên dadweriyê ve cezayê bidarvekirinê bi ser de hatibû sepandin.
Seîd Elmasî yê temen 41 salî, zarokek biçûk heye.

Heta belavbûna vê nûçeyê, nûçeya bidarvekirina "Seîd Elmasî" ji aliyê berpirsên fermî an ragihandinên navxweyê Îranê ve nehatiye belavkirin.bo bicihanîna biryaran hate şandin.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (450)

## Wêneyên xwenîşandanên diyaspora bi hilkefita 34emîn salroja şehîdkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo













